**KT**
**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**
**Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê**
**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**
**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# Di çîroka Bilbilê Hizar Awaz de Peyvsazî

**ABDULLAH BOR**
**12721386**

**Şêwirmend**

**Mikaîl BULBUL**

**Mêrdin 2013**

# NAVEROK


**Naverok…..………………………………………………………………………..….1**

**Kurte ……………………………………………………………..………....2**

**Özet ……….…………………………………………………….……….....3**

**Pêşgotin…….…………………………………………………..……….4**

**1.Beşa Yekem :Peyvsazî…..……………………………………………….…...5**

**1.1.Peyvên Xwerû………………………………………..................................5**

**1.2.Peyvên Pêkhatî……………………………………………………………...6**

**1.2.1 Yên Pêşgir Wergirtî………………………………………………….…...6**

**1.2.2 Yên Paşgir Wergirtî…………………………………………….…….…..7**

**1.3.Peyvên Hevdudanî…………………………………………….…..…..9**

**2.Beşa Duyem:Çîroka Bilbilê Hizar Awaz..........................................................10**

**3.Beşa Siyem:Dabeşkirina Bêjeyên Bilbilê Hizar Awaz………………………......19**

3.1.**Peyvên Pêkhatî…………………………………………………..…...19**

3.1.1.**Peyvên Pêşgir Wergirtî……………………………………………........19**

3.1.2..**Peyvên Paşgir Wergirtî……………………..…………………………..20**

**3.2.Peyvên Hevdudanî…………………………………………………...............20**

**Çavkanî……………………………………………………………………22**

## KURTE

Di çîrokek ji herêma çolemêrgê de peyvsazî an darîştina peyvan mijara vê xebatê ye. Di vê xebatê de armanca me di vê çîroka gelerî de lêgerîn û lêkolînek biçûk bikin û vê çîrokê ji aliyê darîştina peyvan ve vekolin. Ji bo vê armancê me pêşiyê mijar di çend pirtûkên rêziman de ber çavan re derbas kir. Ji pirtûkan nîşe girtin,ev nîşe rêz kirin,mînak jî zêde kirin. Kurtebejek diyar kir. Paşê jî di çîroka ku ji aliyê hevalê me yê ezîz ,Omer Dilsoz ve hatiye berhevkirin a bi navê Bilbilê Hizar Awaz de peyv ji aliyê sazbûnê ve ji hev cuda kirin. Di vê cudakirinê de em li ser peyvên pêkhatî û hevdudanî rawestiyan. Çîrokbêjê vê çîrokê Hecî Cebraîlê Gûzereşî ye. Çîrok di sala 2002an de hatiye guhdarkirin û nivîsîn. Di vê çîroka gelerî de gelek bêje wek dewkî hatine nivîsîn ,hinek jî da ku em bikaribin wan ji hêla sazbûnê ve diyar bikin bi awayê nivîskî hatine rêzkirin. Lê belê bi tu awayî me dest neda naveroka çîrokê.

## KURTEBÊJE

bnr.: binêr

b.n.: berhema navborî

h.b.: heman berhem

j.:jimare

r.: rûpel

s.:sal

ç.:çap

hwd.:her wekî din

weş.:weşan

e.k.:enstîtuya kurdî

## ÖZET

Bu çalışmanın konusu Hakkâri yöresinden bir hikâyenin kelimelerinin yapı bakımından özellikleridir. Amacımız bu halk hikâyesi üzerine küçük bir inceleme ve araştırma yapıp hikâyedeki kelime yapılarını ortaya çıkarmaktır. Bu amaca ulaşmak için öncelikle bu konu hakkında yazılmış birkaç kitabı gözden geçirdik. Bu kitaplardan notlar aldık, notları düzenledik, örnekleri çoğalttık. Arada kısaltmalar da ortaya çıktı. Daha sonra değerli arkadaşımız Ömer Dılsoz'un derlediği öyküyü 'Bilbilê Hezar Awaz' sözcük yapısı bakımından inceledik. İncelememizi türemiş ve birleşik kelimeler üzerine yaptık. Basit yapılı sözcükleri belirtmedik. Bu öykü 2002 yılında Hecî Cebraîlê Gûzereşî tarafından söylenmiştir. Bu öyküde birkaç sözcük konuşma dilinde değil de yazı diline göre yazılmıştır ki kolay incelenebilsin. Öykünün özüne kesinlikle dokunulmamıştır.


**Anahtar kelimeler:**

**bnr.: bakın**
**b.n.: ismi geçen eser**
**h.b.: aynı eser**
**j.: sayı**
**r.: sayfa**
**s.:yıl**
**ç.:baskı**
**hwd.:ve benzeri**
**weş.:yayın**
**k.e:kürt enstitüsü**

## Pêşgotin

Di amadekirina vê xebata me de kesên ku rasterast an nerasterast alîkariya me kirine em malavahiya wan dikin.Di nav van kesan de mamosyetê me yê hêja Mikaîl Bulbul yê yekem e.Bi rênîşandan û xwe gihandina koka mijarê de pêşiya me ronî kir.Hêvîdar in ku me zêde serê vî zanayê hêja neêşandibe.Û dibêjin tu her hebî.

Kesê duyem jî hevalê me yê ezîz,nivîskar Omer Dilsoz e.Vî mêrxasî jî bi çîroka ku zehmetî berhevkirî ji nav xizîneya xwe derxist û da me ku em vê bikar bînin. Mala we ava be kekê ezîz.

Her wiha gelek spas ji kedkarên zimanê kurdî re.Ji ber ku her gava wan di demê xwe de avêtî ya bizanîstî,bêxemsarî û dilsaxî îro li ber me wek ronahiyekê disekine.Çiqas dem bihure jî em xwendevanên vî zimanê qedîm baştir fêm dikin ku keda ji bo zimên bê dayîn tu çar berze nabe.

Wek kowar,rojname,pirtûk kê/î çi li xizîneya zimanê me zêdekiribe hezar caran malên wan ava be.

## 1.BEŞA YEKEM:PEYVSAZÎ

**Ji Aliyê Sazbûnê ve Peyv:** Peyv li gorî xwerûbûnê(bêqertaf) ,qertaf girtinê û hatina ba hev ya hin peyvên din ve saz dibin.

Di Kurdî de peyv ji aliyê dariştinê ve dibin sê cure.

**a-peyvên xwerû**

**b- peyvên pêkhatî**

**c-peyvên hevdudanî**

**1.1.Peyvên Xwerû**: Ji hêmanekê pêk tên û ev hêman nayê ji hev kirin û wek kok tê zanîn. Kok bê qertaf in û dibin du bir.(1)

**A-Kokên navdêrî**: Ev cure kok di eslê xwe de navdêr in tevgerekê nîşan nadin.

**Mînak**: Roj,hest,heyv,dûr,bîr,av,agir,ax,ser,zik,nan,dem,esman

erd,dil,sêv,xox,tirî,hesp,mih,dîk,gur,hirç,zû,pêr,par,duh,xêr,

sor,nû,kevin,kesk,kin,jîr,hişk,şaş,pir,kêm,Zin, Cizir, Wan, kur, keç, zava, tili, dezi, kevir, dar, rê, rû, sal, şeş,du,deh…

**B-Kokên lêkerî**: Ev kok tevgerekê nîşan didin,bi serê xwe lêker in.

Di kurmancî de ji bo lêkeran du kok hene:Dema borî û dema niha.

**a-Koka dema borî:**

Lêkerên bi 'in'ê diqedin de dema 'in' hat derxistin ev kok tê destxistin.

**Mînak**: Hat,dît,mir,ket,xwar,sot,girt,givaşt,nivist,kuşt,avêt,bir,

firot,hişt,got,biraşt…

Lêkerên bi 'în'ê diqedin de dema tîpa 'n'ê hat avêtin kok li gorî dema borî teşe digire.

Mînak: Bezî,firî,kenî,zanî,birî,anî,girî,tewizî,karî…

1 Mikaîl BULBUL-Bahoz BARAN,Rêzimana Kurmancî,weş.ens.kurdî ya Amedê,r.31

**b-Koka dema niha:**

**Mînak**:
Ger,bêj,kar,bar,meş,kel,soj,west,xwaz,êş,çir,rêj,rev,bez,pêç,kol,bîn,wêr,zan,kar,zê…

**1.2.Peyvên Pêkhatî:** Di van cure peyvan de li koka peyvê yan jî li peyvê herî kêm qertafek zêde dibe,peyv wateyek nû digire.

Di kurdî de peyvên dariştî bi alîkariya qertafên pêşgir û paşgiran ve pêk tên.

**1-Qertafên Pêşgir:** Yên ku herî zêde tên bikaranîn.(2)

/da-/: dadan, dagirtin, daketin, dahatin, daxwaz,dagerîn…
/ra-/: rabûn, radan, ragirtin, rahiñtin, rakirin,
/ve-/: vebûn, vedan, vegeriyan, vejandin,vexwarin,vexwandin,
/hil-/: hilkişîn,hilanîn, hilhatin, hilfirîn,hilketin,hilbijartin
/wer-/: wergirtin,wergerandin,werpêçîn…
/çê-/: çêbûn, çêkirin…

/rû-/: rûkirin, rûniştin, rûdan…

/ro-/: rokirin, robûn…

/zir-/: zirbav, zirbira, zirhinar,zirdest,…

/bele-/: beleguh, belegoşk, beleçek…

/kele-/: kelevajî, kelepor, keleşêr…

/tele-/: telebext, telexewî…

/bi-/: bikir, bican, bibext…

/bê-/: bêxêr, bêkêr, bêav, bêgav…

/ne-/: nemir, neçê, nexweş, nesax…

/nav-/: navteng, navdest, navmil…

/der-/: dergîstî, dermal, derpê, derdan…

2 Celadet BEDIRXAN-Roger LESCOT,Gramera Kurdî,ens. Kurdî ya Parisê,r.290

/ber-/: berbûk, berav, berdan…

/bin-/: binav, binderî, binpê, binbelg…

/ser-/: serçong, serdest, serkfeftin, serçavî…

**2-Qertafên Paşgir:**(3)

/-a/: zana, beza…

/-î/:gundî,nêrî,qelandî,bilindî,Wanî,erebî…

/-în/: darîn, zêrîn,revîn…

/-tî/: nezantî, hevaltî,koletî…

/-ahî/: mirovahî, keskahî,dirêjahî…

/-e/: şande, nerme,zînde,…

/-al/: tengal, heval,…

/-ak/: ronak, civak…

/-anî/: xortanî, ciwanî…

/-ane/: şêrane, mêrane…

/-ar/: gotar, mirar,gemar,kêmar…

/-çe/: navçe, deryaçe,xalîçe,bexçe…

/-asî/: tengasî, kêmasî…

/-asa/: dêwasa, qerasa,dewasa…

/-atî/: kirîvatî, mirovatî,serokatî…

/-bar/: dîtbar, gunehbar,guherbar…

/-dank/: soldank, guldank,derzîdank,…

3 Mikaîl BULBUL-Bahoz BARAN,Rêzimana Kurmancî,weş.ens.kurdî ya Amedê,r.33

/-awer/: cengawer, dilawer…

/-bend/: solbend, nalbend…

/-dar/: brîndar, maldar…

/-dêr/: çavdêr, berxwedêr…

/-ek/: tirek, çilek,zîrek

/-geh/: girtîgeh, rawestgeh…

/-istan/: Îngilistan, gulistan…

/-xane/: nexweşxane, avdestxane…

/-ik/: jinik, kêrik,kevçik…

/-kar/: cotkar, xwendekar…

/-onek/: bizdonek, torsonek…

/-saz/: diransaz,karsaz,avahîsaz…

/-van/: şivan, berxvan,bilurvan,…

/-bêj/: dengbêj, çîrokbêj,xeberbêj…

/-kuj/: mêrkuj, agirkuj,…

/-kêş/: barkêş, şûrkêş,xîretkêş,…

/-ker/: zêrker, hînker,şolker…

/-ber/: xoyber, dilber,rencber,koçber…

/-andin/: sorandin, tengijandin…

/-în/: livîn, xemilîn,bezîn,kelîn…

/-ijandin/: tengijandin, pijandin,rijandin,…

**C-Peyvên hevedudanî:**

Peyvên hevedudanî ji çend hêmanên wateyeke serbixwe ye,ew peyv ku li gorî rêz û rêzikên zimên digihên hev ,peyveke nû pêk tînin.Ango pirî caran wateya peyva nû ji yên ku wê pêk tînin gelekî dûr e.(3)

**1-Du navdêr têne ber hev navdêrekê yan jî rengdêrekê çêdike.**

Mînak:

kerbav,destav,pozberan,gulbihar,jinbira,marmasî,dilkevir,malzarok,şorbeşîr…

**2-Navdêr û rengdêrtêne ber hev ,navdêr û rengdêrekenû pêk tînin.**

Mînak:

destdirêj,çavreş,guhbel,kumsor,stûxwar,sorgul,serhişk,germav…

**3-Navdêr an jî rengdêr bi lêkerê ve digihin hev û lêkerên hevdudanî pêk tînin.**

Mînak:

sorkirin,geşkirin,balkişandin,kurkirin,bêhnvedan,badan

nexweşbûn,xeberdan…

**4-Hin caran tîpa 'û' yê du peyvan digihîne hev.**

Mînak:

*Dêlegur,heyveron,karûbar,keçebav,keskesor,kisbûkar,kurebav,*

*nêreker,nêrekew,*

**5-Peyv an jî lêker wek biwêjan tên pê.**

Minak:

Pêhesîn,xwe bi destî ve berdan,sêhr lê kirin,jêk dirandin,lê kirin,bi rê ketin,

4 Samî TAN,Rêzimana Kurmancî,weş.enst.kurdî ya Stenbolê,r.63

## BEŞA DUYEM

### Çîroka Bilbilê Hizar Awaz

Xwedê hez ke, ez ê niha bo civatê çîroka Bilbilê Hizar Awaz bibêjim.

Dibêjin li cihekî padîşahek hebû, wî du jin hebûn. Şeş eyal/zarok hebûn. Sê kur sê kiç… Jina biçûk du zarok hebûn, kurek û kiçek; ya dî jî çar…

Rojekê ji nav rojan padîşah li gel zarokên xwe rûniştiye, nêrayê/lê nihêrt sê zilam hatin, gotin, “Selamû eleykum”

“Elekumeselam” gotin û rûniştin,

“Hûn çi kes in”

Wan got, “Em derwêş in”

“Xêr bîtin hewe?” padşay gotê,

wan gotê, “Ser hezkirina Xwedê em bo xwe hatine kiçên te.”

Hema we!/wisa…

Padşay gote zarokên xwe, ka em çi bikin, em xwîşkên we bidine vana an na?

Hemûyan got, “Em nadinê”, lê belê kurê biçûk Mîrza Mihemed got, “babo, em bidinê.”

Birayên mezin gotin, “Em bi xeberî Mîrza Mihemed nakin, em xwîşkên xwe nadine van kesan.” Lê bavê wan got, ez ê bi xeberî kurê xwe yê biçûk Mîrza Mihemed bikim û kiçên xwe bidime van xwazgîniyan.

Rabû her sê kiçên xwe dane wan derwêşan; ew jî bira bûn. Kiça biçûk da birayê biçûk, ya navê da birayê navê û ya mezin jî da birayê mezin.

Wan kiç bo xwe birin û çûn.

Vêca qesa me hate ser padşay: Rojek ji nav rojan nîvro ye, dinya hetav e, padşa ji eyalên xwe xerîb e, çûye ser banê qesra xwe. Nêrayê eve gerasîskek bay hat perek di nav de, wî perî difirînite ser banî. Perî hildigirît; perekî gelek law e. Nizanît çi per e.

Mezinên cihên xwe yên bajarî hemû civandin, gotê, “Eve çi per e? Ez nizanim ka perê kîjan teyr û balindeyî ye…”

Yekî ji wan got, “Eve perê Bilbilê Hizar Awaz e.”

Padşay gotê, “Min divêt demildest bo min xwedanê vî perî bînin heke ez ê bimirim.”

Hemûyan gotê, “Bila zavayên te bo te bînin ewên te kiç danê.” Rabû berê xwe da kurên xwe, wan jî gotê, “Bila kurê te yê biçûk Mîrza Mihemed bînit heke xwîşkên me nedabana derwêşan da niha zavayên me gel me bên em da biçin bo te li teyrî bigerin.”

Li ser vê kurên me hema ji kerba rabûn, xwe avêtin ser hespên xwe û berê xwe dane oxirê û pişta xwe felekê.

Lê belê heçî Mîrza Mihemed bû, bi tedarik rabû çû barê xwe hilgirt, xurcikên hespê xwe tijî dexl û dan, ar û rûn kir. Kurê cîranê xwe Ehmed jî da gel xwe, gotê her roja wî ez ê zêrekê zer bidimê. Bila ew di vê wexerê de li gel min bît.

Mîrza Mihemed û Ehmed wê şevê gihîştin qonaxê. Go, “Dê Ehmed rabe bo me şîvekê çêke, hespên me bitewlîne.” Roja paştir ji wê qonaxê rabûn, heyamekê çûn nêran ku li lêva warekî du hesp… Mîrza Mihemed gote Ehmed, “Evên henê birayên min in, ji birsa ketine, rabe zû leqek nanî bigihînê heta ez têm.”

Mîrza Mihemed çû nik, gotê, “Bira ma hûn bo çi bê nan hatin, we çima hin kire lez û bez. Rabin da em bi hev re biçin.”

Her çar rabûn û bi rê ketin, heke dûr heke nêzik, gihîştin serê sêryanekê. Ewê sêryanê qesrek wê lê, (lê heye) ew qesir jî wê li ber wê sêriyanê ye; Çi rêvîngên diçin, yên neşareza da nîşan bide ku eve riya nehatneveyê ye, eve ya hatûbatê ye û eve ya hatneveyê ye. Qesrek bo xwe ava kiriye,pîremêrek lê ye. Rabûn çûne nik pîremêrî, gotê, “Mamo dê me bihewînî,” gote wan, “Ma jixwe ez ji ber mêvanan li vê derê me. Min ji ber hindê ev qesr ava kiriye, mêvan mêvanên Xwedê ne, bi ser serê min û çavên min hatine.”

Heta sibê mane wê derê.

Paşê pîremêrî rê nîşanî wan dan; gote wan, yek riya nehatneveyê ye, yek a hatûbatê ye û ya dî jî ya hatneveyê ye.

Mîrza Mihemed gote birayên xwe, ka werin hingustîkên xwe derxin, pêk ve çûne serê sêriyanê deynan bin berekê, gote wan, “Heçî hateve/vegeriya da binêre ka kî ji wan vegeriyaye. Îşareta me ev hingustîlk in.”

Mîrza Mihemed berê xwe da riya nehatneveyê; Her du kekên xwe jî rêkirin bo herdu riyên dîtir. Mîrza Mihemed her du birayên xwe bi rê kirin, paşê vegeriya ser Ehmedî û gotê, “Hilo da biçin.”

Qederekê çûn, gurek hat rast ket. Nêrayê gur kete dû pê hespên wan; Gur hêdî hêdî dihejît diloqiçîtin. Mîrza Mihemed gote Ehmed, “Ehmed ev gur birsî ye hinek nanî bavêje ber.” Ehmed jî hinek nan avête ber gurî. Heyameke dî jî çûn, bi nîvrokî ve

carek dî hinek nan da gurî. Êvarî qesrek dît ji dûr ve, çûn nêzîkî qesrê bûn gurgî xwe vegirt. Ewan pariyek dî yê nanî avête ber gurgî û çûne wê qesrê, nêran kiçek wê li wê derê…

Gotine wê, “Tu çi kesî, çi dikî li vê derê?”

Got, “Ez jî ebda Xwedê me.”

Wê gotê, “Tu kî yî, çi kesî, ji kî ve dê bi kî ve biçî?”

Go, “Ez Mîrza Mihemed im. Dê biçime Bilbilê Hizar Awaz…”

“Gotê, “Hema neçe, wê di destê dêwî de. Tu neşêy hema min bo xwe bibe û vegere erdê tu jê hatî.”

Mîrza Mihemed gotê, “Ez nehatime bo te, li bajarê me jî gelek kiç hebûn. Ez hatime Bilbilê Hizar Awaz bo bavê xwe. Heke tu welê yî, gava vegerê ez ê te bi xwe re bibim.”

Mîrza Mihemed gote kiçkê, “Tu zanî ev çi gur e duhî li dû me ketî?”

Kiçê gotê, “Ew babê min e. Em sê xwîşk in. Îşev hûn mêvanê xwîşka min a navê ne, sibehî ya mezin. Lew navê vê derê danîne rêya nehatneveyê heçî kesê dihat diket ber xezeba bavê min. Me hersê xwîşkan jî –em her sê jî Perrî ne- me sêhr lê kir û ew kire gurg da rêvîng bikaribin di vê derê re bên û biçin.

Roja paştir sibê xatra xwe ji kiçê xwest û çûn.

Êvarî bûne mêvanên xwîşka navê, wê şevê mane wê derê. Wê jî gote wan, ew bavê me ye û serhatiya xwe bo got.

Şeva paştir çûn bûne mêvanên xwîşka mezin. Wê jî heman serhatî û sohbet li gel wan kir û ewtembî kirin ku neçine Bilbilê Hizar Awaz, ew di destê dêwî de ye û dêw dê wan bikuje.

Xwîşka mezin gote wan, madem hûn dê her biçin vê ez rê bo we bêjim; Gava hûn ji vê derê qederekê bi dûr ketin, hûn ê bikevine nav deştekê, paşê ji dûr ve dê çiyayek bête ber sînga hewe. Li pala wî çiyayî şikeftek dê berçav bibe. Hespê xwe li binê palî bihêle, dêw di şikeftê de ye û Bilbilê Hizar Awaz jî di revezkê de li ber serê wî ye. Heke dêw di dew de bît tu û êxbala xwe! Belê heke hişyar bit, wele ya te çû!

Mîrza Mihemed li binê çiyay hespê xwe teslîmî Ehmed kir û xwe da binê evrazî. Şûrê wî wê li gel… Xwe da binê evrazî, hêdî hêdî ser ket, heyamek kêşa evrazî… Gihîşt derê şikeftê nêra ku dêw dike pixpix bi xew e. Rahişte bilbilî hingê dît ku eve baskeke dirêj jî li wê derê. Xasma kiça gurgî gotibûyê, ji bilî bilbilî nebî rahêjî çu tiştî, lê Mîrza Mihemed timahiya xwe bire wî baskî û ew jî hilgirt. Wexta dest avêtî baskî dêw qirp hişyar bû û milê wî girt, “Tu çi kesî?”

Navê te çi ye û tu bi çi mexsed hatî?”

Gotê, “Navê min Mîrza Mihemed e, ez bo bavê xwe hatime, bavê min nesax e wê li ber mirinê… Xema wî, xeyala wî Bilbilê Hizar Awaz e.”

Dêwî gotê, “Bila ez ê bidime te, belê divêt tu bo min tiştekî bikî… Li filan çiyayî dêwekî kor heye, wî bavê min kuştiye û şûrê wî biriye, tu yê biçî bo min wî şûrî bînî da ku ez pê tola xwe bihilînim.”

Mîrza Mihemed hate nik Ehmed, hemû metele bo got û gotê, “binasên min bû, min timahiya xwe bire baskî… Vêca divê niha ez biçim filan çiyay bo dêwî şûrê dêwê kor bînim. ”

Nîvro ye, ew radibin li wê derê pêkve nanekî dixwin û paşê Mîrza Mihemed xwe dide çiya û diçe wê derê. Dêw li wê derê ye, kor e wî nabîne. Nêrayê, şûr di ber banê şikeftê re ye, bilind e, nagihîtê. Hindî xwe dihilavêje nagihêjê. Paşî devê şûrê xwe gihande qebza şûrî ew ji kavlanî kişand û kir çip û li nava şikeftê ket.

Deng jê hat.

Hingê dêwê kor pê hesiya ku kesek hatiye wir. Wî jî rabû sêhre kir û deriyê şikeftê bi yekcarîdada.

Dêw gotê, “Tu çi kesî?”

Gotê, “Ez Mîrza Mihemed im. Kurê filane padşa me.”

“Tu bi çi hatî?”

“Ez bo vê yekê hatime ku Bilbilê Hizar Awaz bo bavê xwe bibim. Filan dêwî gotiye min, ‘heta tu şûrê dêwê kor neynî ez nadim te’, ez jî hatime şûrê te!”

Got, “Baş e ez ê bidime te, lê ez ê tiştekî ji te bixwazim. Heta tu Gulindana kiça Pepûyê Freng bo min neynî ez nadim te!”

Ew jî dîsa bi xwarê dikeve. Diçe nik Ehmed, dibêje, “Rabe em biçin. Serhatiyê bo dibêje.”

Li hespên xwe siwar dibin, here kûr çûn heke nêzik çûn gihîştine bajarê Pepûyê Freng. Bajarê Pepûyê Freng avek di nîvekê re diçîte xwarê, qayik û kelek li ser dikişin. Dêwê kor gotibûyê, “Eve di şikefta min de her celeb aman û firaqên zêrîn hene, rabe têra xwe hilde, bi xwe re bibe, xwe wek bazirgan bide nasîn da ku kiça Pepûyê Freng bête qayikê nik te û tu jî bişêy dest bihilînî.”

Ew çûn, barên xwe vekirin, zêrên xwe danîn ser dezgehê xwe û birin nav qayikê. Hemû kes hatinê, tiştên kesnedîtî gel wan bûn. Milet wekî teyrên li kelexan kom dibin, wisa li ser dezgehê wan kirine qelebalix.

Kiça Pepûyê Freng jî hat, gava Mîrza Mihemed dît keyfa wê çûyê. Gotê, “Navê te çi ye?”

“Mîrza Mihemed”

“Tu bi çi hatî?”

“Ez hatime te!” û serhatîya kit kit bo vegot.

Gulindanê gotê, “Were em planekê bigerînin.” Rabû Mîrza Mihemed bire nik merengozî, heykelek dar pê da çêkirin. Destek cilên xwe kirine ber û Gulindan jî li hespê xwe siwar bû, kete gel Mîrza Mihemed û gotê, “Yelleh em biçin!”

Gihîştin binê çiyê, Gulindan û Ehmed li wê derê man, heykel da Mîrza Mihemed û gotê, “Gava nêzî dêwî bûyî bêjê bila şûrê xwe deyne ber şikeftê, ew ê ji bêhna cilên min jite bawer bike. Tu jî heykelî paldeber devê şikeftê paşê gazî dêwî bike.”

Mîrza Mihemed çû heykel danî devê şikeftê, şûrê dêwî hilgirt. Dêw wisa xwe di heykelî wer kir ew qirmiçand. Paşê pê hesiya ku ew hatiye lêbandin, ji qehra di cih de mir.

Mîrza Mihemed şûr da dêwê xwedanê Bilbilê Hizar Awaz, wî jî bask û bilbil danê, wan jî ew hilgirtin û hatin; her sê keçên gurî jî bi xwe re anîn, wan jî sêhra li ser bavê xwe betal kir û hemû bi hev re gihîştin qesra serê sêryanê. Hatine wir nik pîremêrî.

Mîrza Mihemed her çar jinan li nik pîremêrî dihêle û bo dîtina birayên xwe dikeve rê. Pîremêr dibêjê, “Mîrza, ji jinan re bêje bila xweliya xwe nerêjin nav wê coxîna mezin a dora qesrê, ew cihê keyfa dêwê fîrinde ye. Heçî xweliya xwe birêjê dê bikeve ber bayê xezeba dêwî…”

Berê diçe dû birayê xwe yê mezin; Riya hatûbatê…

Gava diçe wê derê pîrejinek tête berahiyê, dibêjitê, “Wêê kurê min tu ser çavan hatî. Ez jî bo xwe li mêvanan digerim. Min jî mirovekî weke te divêt da pêlavên min deyne ber destê min. Ez dayka te, tu kurê min.”

Mîrza Mihemed çi diçîte dibînit eve birayê wî li wê derê, bo xwe dibêje, “Himm wele vê ,wê birayê min telaftî!” belê ma çi bike, çi tişt ji destî nayê.

Nêrayê eve pîrê bo nivîn înan, cih bo deynane menzelekê. Bêhna ma, şevê çû nav cihê xwe de, nêraye eve kiçeke çarde panzde salî rûs şibî tiblê çûn bin cihên Mîrza Mihemed ve… Mîrza Mihemed gotê, “Eve çi ye?”

Gotê, “Tu dê vê şolê li gel min bikî.”

Mîrza Mihemed xwe dizivirîne ser piştê, wî dizivirîne, xwe qel dide ser teniştê, ew wî dizivirîne, ser tenişta dî ew dîsa wî dizivirîne, axir heta sibê Mîrza Mihemed xwe bi destî ve berneda. Wextê heta sibê xwe bi destê pîrê ve berneda, ew ji qehra

sikitî û mir.

Çû nêrayê, birayê wî seviyek wê li nav milan ve, heta êvarî bo xelkî zibilî dikêşit. Pîrê sêhr lê kiribû. Ewî jî morek li nav eniya birayê xwe da û bire hemamê, sabûn bo hilgirt û gotê, dê xwe bişo.

Piştî ku Mîrza Mihemed birayê xwe mezin şûşt û veşûşt, pak û paqij kir, destek cilan lê kir û da gel xwe, pêkve vegerîn bo qonaxa xwe serê Sêryanê.

Gava gihîştine vê derê, berê xwe dayê ku her sê kiçên gurgî xuya wê derê re belê Gulindan xweya nakit, şûnebaka wê jî li wê derê nayête çav. Ew pirsa wan ji pîremêrî dike, pîremêr dibêje, "Hindê min gotê guhê xwe neda min rabû xwelî rû kirecoxînê, Dêwê Firinde jî hat û ew bi xwe re bir."

Mîrza Mihemed gote, ez ê berê biçim birayê xwe yê navê jî bînim, ku ew çûbû bo riya hatneveyê, paşê jî ez ê di hewara jinan biçim.

Mîrza Mihemed gava gihîşe qonaxê dît ku pîrejinekê eynî pêşwazî lê kir, wî xwe bi destan ve bernede, ew jî ji qehran mir. Paşê Mîrza Mihemed çû nêrayê birayê wî gavan e, cilên wî bêserober in, hilhilî ne, pêlavên wî wê diriyayî, heta êvarî wê li dûv çavirê ve, hêve dibezît wêve dibezît…Mîrza Mihemed birayê xwe yê navê ji ber çavirê îna, bire hemamê, ew jî şûşt û veşûşt, paşî rabû morek li nav çavên wî jî da û ew gel xwe îna bo serê Sêryanê. Civata xwe gerand û got, "Pîremêr, tu şahid be; Ez eve dirabî biçime dû Gulindanê, dinya ye te dît ez nehatim, heke hato ez di qewlê çend rojan de nehatim, tu kiça mezin bide birayê min ê mezin, a navê bide yê navê û ya biçûk jî bide Ehmedê xulam… Ez eve diçime hewara Gulindanê!"

Mîrza Mihemed çû çû çû gelek rê û dirb li bin simê hespê xwe kevnemijê êxistin û gelek çiya û gelî li paş xwe hêlan. Gihîşte nehalekê qesrek ber ve xuya bû. Ewî textena qesrê kir, gava nêzî bû, nêrayê eve xwîşka wî ya biçûk –ya bi dayik û bavî- hate berahiyê.

"Mîrza Mihemed, her serê xwîşka xwe hatî! Eve tu ji kî derê tê. Ez gelek wê ji te xerîb bûyîm…" çû serûstûyan…

Hal û wextê hev pirsîn, Mîrza Mihemed gotê, "Xwîşkê mêrê te kî ye?"

Gotê, "Mêrê min dêw e; dêwê reş."

Gotê,"Heyne!"Wê gotê, "Belê wele mêrên me hersêyan dêw in. Erê bira eve te xêr e, tu bi çi mexsed û mirazî hatî?"

"Dezgira min Gulindana kiça Pepûyê Freng dêwê firinde biriye, ez ê bi dû wê biçim."

"Mêrê min serokê çend şêrên dinyayê ye. Niha çûye nêçîrê bila bêt ez ê jê bipirsim ew belkî tiştekî jê bizanibe ka matenê dêwên firinde kî derê ye."

Bû êvar, dêwê reş ji nêçîrê vegeriya. Jina wî gotê, mêvanê me heye; wî gotê, "Heke Mîrza Mihemed nebît kî bîtin ez ê bi neynûkên xwe jêk bidirînim."

Gotê, “Mîrza Mihemed e.”

“Mîrza Mihemed, ser serê min û bavê min hatiye.”

Wê şevê Mîrza Mihemed mane wê derê, dêwî pirsa welatê Dêwên Firinde ji hemû şêran kir, wan got, em nizanin. Roja paştir nanek bo deyna û ew bi rê kir. Çû çû gihîşte qesrekê, vê carê jî xwîşka wî ya navê hate berahiyê. Hal û hewalên xwe bo wê gotin, wê jî gotê, mêrê min Dêwê Spî serokê hemû pilingên dinyayê ye. Wê şevê ma wê derê bi mêvanî… Dêwî pirsa welatê dêwên firinde ji hemû pilingan kir, wan jî got, em nizanin û Mîrza Mihemed dîsa bi rê û rêbaran ket.

Vê carê qonaxa wî qesra dêwê sor e. Xwîşka wî ya mezin hate berahiyê, hal û serhatiya xwe hemû bo got, wê gotê, “Mêrê min serokê sîmirxan e. Ew niha dizanin ka welatê dêwên firinde kî derê ye.”

Roja paştir dêwê sor hemû sîmirx cemandin, wan jî em nizanin, yekê ji nav wan got, “Metek min wê hey, heftê hezar salî ye, heke ew bizanit. Pîr e û li berpalekê bi tinê serê xwe ye.” Li ser vê gotinê, rabû du simirx çûn, ew sîmirxa pîr deynan ser perên xwe û înane wê derê.

Sîmirxa pîr perên wê weriyabûn, nedişiya xwe li piyan bigire. Rabû gote wan, “Min bikin nav gûfankekê re, dûngekê danê sibê bo taştê, yekê nîvro bo navrojê, yekê êvarî bo şîvê bidine min. Heftêyekê wisa bikin, heke dûmahîkê hewe dît sîxên min di gûfankî ra avêtin, hingê ez ê bikarim biçim nexwe wekî dî bêhêvî bin.”

Hefteyekê sîmirx hêla wê derê û bi dûngî xwedan kirin. Paşî nêrayê ku sîxên sîmirxê weke heliza di befirê re têne derê wisa di gûfankî re avêtine derê. Sîmirx hate derê, gotê, “Herin heft pezan serjê bikin, heft dûngan bo min bînin hilo em biçin. Mîrza Mihemed kerem ke li pişta min, li ser bask û perrên min cihê xwe çêke!”

Mîrza Mihemed lê siwar bû, sîmirxê gotê, “Ka dûngekê bide!” dayê, sîmirx rast bilind bû, bi ser ewran ket, gotê,

“Mîrza Mihemed tu çi dibînî?”

gotê, “Ez çi tiştî nabînim.” Dûngek dî jê xwest. Heta nîvro ber jor hilkişiya, gotê, “Mîrza Mihemed tu çi dibînî?” gotê, “Ez bajarekî dibînim.”

Go, “Ez bajarekî dibînim”

Gotê, “Timam, ew der welatê dêwên firinde ye.”

Rast çûn çûn li lêva çemekî dada. Sîmirxê dûngek ji Mîrza Mihemed xwest, go, ev şîva min e. Em ê îşev li vê derê bêhna xwe vedin. Sibê dade çemî û here.

Bû sibe. Mîrza Mihemed çû xwe gihande devê qesrê, nêrayê din av baxçeyê wê de Gulindana kiça Pepûyê Freng stûxwar û perîşan e, rondikên wê hema bêje wê giyay şîn dikin hindî hin têne xwarê. Gava çavên Gulindanê pê ketin, gotê, “Da biçin, hewar min

xilas ke!" Mîrza Mihemed xwe enirand û got, heta ez dêwê firinde nekujim ez nazivirim.

Gotê, "Tu neşê bikujî" Gulindanê weha gotê, wî go, "Belê ez dê bikujim."

Mîrza Mihemed xwe gihand dêwî, şûrê xwe daweşandê, gotê, "Wey ez xweşîcan im, tu yî yê Gulindana min direvinî, ca dest bihelîne!"

Mîrza Mihemed çawa şûrê xwe daweşandê nêrayê tiştek wekî bîlyayê hema hatê. Hema digihîşta kî dera Mîrza Mihemed kulek lê vedikir, Mîrza Mihemed gelekî tengav bû. Kêm mabû ku bikeve, neşiya çi bizavê ji xwe çêke, şeq li cihê xwe sekinî, şûrê xwe rast girt, dêwê weke babelîskê dizîkzikî li devê şûrî aliqî û di nîvekê re bû du ker. Dêw li wê derê mir. Herdu hatin nîk sîmirxê, li pişta wê siwar bû û sernişîvî xwarê bûn.

Gihîştin nik dêwê sor, wî her yekê hepsek dayê lê siwar bûn û hatine qonaxa xwe ya serê Sêriyanê nik birayên xwe.

Şevekê li wê derê man. Roja paştir bo bajarê xwe ketin rê. Heçî Mîrza Mihemed bû ewî hinekî xwe vegirt, xwe vehêla, ew ma gel jinan û her du birayên wî berî wî gihîştin qonaxekê. Qesrek li wê derê bû û ber derê wê bîrek hebû. Van herdu birayan înan berikek deynan ser devê bîrê, her yekî xwe da rexekê û mane hêviya Mîrza Mihemed. Navberekê Mîrza Mihemed jî lezand, karwan vehêla da ku bigihêje birayên xwe, gava gihîştê wan rabû gotê, "Were bira em gelek ji te xerîb in, tu were nîveka me herduyan li ser berikê rûne da ku em piçek keserên xwe pêkve birevînin." Çawa Mîrza Mihemed li ser berikê rûnişt, wan xwe sist kir û wî kir gurm û di binê bîrê wer bû.

Bîskek dî karwan jî hat, gava Gulindanê pirsa Mîrza Mihemed ji birayan kir, wan gotê, "Qet û qet hayê min pê nîne. Weke bayekî hat û ji me perrî û çû. We reng e wî em hemû li vê derê, di rê de hiştin."

Berî wan xeberê hatina wan gihîşte bajêr. Hazirî hatin kirin, xeber geriya ku kurên padşay çûne Bilbilê Hizar Awaz înaye û ligel birrek jin û xatûnan û eve ha ha ye gihîştine bajarî.

Gava gihîştin nik bavê, wî pirsa Mîrza Mihemed ji wan kir. Kurê mezin axivî, "Wele te kur hene! Ma heke Mîrza Mihemed camêr bûya ma dê xwîşkên xwe dabana dêwan. Her sê zavayên te dêw in."

"Çawa dane dêwan?"

"Belê wele her sê dane dêwan."

Gulindan bi vê planê hesiya, xwe avête odeya dayika Mîrza Mihemed, şûrê xwe kêşa, dergeh asê kir û got, "Bila çi kes bi ser min ve neyê. We Mîrza Mihemed telaftiye."

Heke rojek çû, heke hefteyek, heke mehek, rojekê karwanek hat deyna ser wê bîrê. Avê bo xwe hildikêşin; bo xwe, bo dewarên xwe… Wextê satil berdane xwarê Mîrza

Mihemed destê xwe danê, ser ket. Hema ruh tê mabû. Gote serokê bazirganan, "Ez ê gel te bim, dewarên te av bidim, bar bikim, tu min bigire gel xwe!"

"Hay hay" gotê Serokê bazirganan û hatin gihîştin devê bajarê bavê wî. Bazirganan Mîrza Mihemed li wê derê hêla ber dewaran û ew bo bazirganiyê çûne nav bajêr bûne mêvanê

padşay. Bazirgan koda wî didinê, padşa jî gelek qedrê xwe digire. Vêca Mîrza Mihemed rabû çi kir; dewar hemû berdane nav genimî. Xwedanên genimî hatin, bû qîryana wan. Serokê bazirganan gote Mîrza Mihemed, "Eve çi ye, te dewar berdane nav zeviyan, genim hemû çerandine?" Mîrza Mihemed gote wan, "Min berdane nav, heywanan birsî ne, hûn çûne mala padşa wek têr xwar, ma ew ê birsî bimînin."

Xwedanên zeviyê çi kir nekir neşiyan çu rayê bidinê, gotin, a qenc ew e ku biçine nik padşay bila ew mesela me ji hev safî ke.

Serokê bazirganan, Mîrza Mihemed û xwedanên zeviyê çûne dîwana padşay. Padşa gotê navê te çi ye, wî bo xwe navek derêxist; An Elî, an Husên…

"Te bo çi genim çerandin" padşay gotê.

"Padşayî xweş bîtin!" gotê Mîrza Mihemed, "Xwedê ava bike, mala te avedan e, bi adan e, têr û tijî ye, çi tiştê Xwedê dayî wê hey, ew jî heywanên reben birsî ne. Bi ser bextê min in, vêca ez çawa wan birsî bihêlim. Ji ber hindê jî min ew berdane nav genimî."

Birayê wî yê mezin lê xurî, "Kuro tu çi di ber babo diaxivî terez! Kê axaftina daye te tu hin diaxivî bila xwedanê dewaran biaxivît…"

Gote birayê xwe yê mezin, "Terezê ser terezan jî tu yî; Tu çi diaxivî ez digel bavê te wê diaxivim, ma digel te!..."

Dey dey bû axiftina wan, dûmahîka dûmahî gotê, "Tu çi kes î? Navê te çi ye?"

Hingê Mîrza Mihemed ji dergevanî xwest ku kilîta derî bidine wî, wî jî rûpêşa ber rûyê xwe vekir û xwe aşkera kir ku ew Mîrza Mihemedê birayê wan ê biçûk e. Ji dîwana padşay xwest li morên nav serê birayên wî yê mezin û navê binêrin û tişta înaye serê wî, bo wan her tişt vegot.Bavê wan jî kete navberê, nexwest zarokên wî jêk dilmayî bibin, ji ber wê sulha wan kir, ew pêk înan…

Îna daweta Mîrza Mihemed û Gulindanê kir, ew gihîştin miraza xwe, heft şev û heft rojan dawet û şahî gerandin, em ji wirê hatin me leqek pîvazê jî gez nekir.

Çîroka me li diyaran,rehmet li dayik û bavê guhdaran…

## 3.Beşa Siyem: Dabeşkirina Bêjeyên Çîroka ‘ Bilbilê Hizar Awaz’

## 3.1.Peyvên Pêkhatî:

### 3.1.1.Peyvên Pêşgir Wergirtî

/Ve-/: Vegotin, vegirtin, vedan, vegeriyan, veşûştin, vegerîn, vekirin, veger,

/Hil-/:Hilkêşîn, hilhilîn, hilgirtin, hildan, hilavêjtin, hilanîn,

/Ne-/:neşareza,

/Ber-/:berdan,

/Der-/:derêxistin

/Ra-/:,rabûn,

/Çe-/:Çêkirin,

/Da-/:dadan,daweşandin,

/Ra-/: rahiştin,

/Ber-/:berpal,

/Rû-/:rûniştin,

/Bê-/:bêserober,

### 3.1.2.Peyvên  Pêşgir Wergirtî

/andin/:Çerandin,revandin,lezandin,cemandin,gerandin,qirmiçandin,dirandin,hilandin,tewlandin,firandin,civandin,gerandin, lêbandin,

/-în/:Axivîn,zîkzikîn,pirsîn,karîn,qîryan(qêrîn),nasîn,zêrîn,

/-ik/:dayik,nêzik,hingustîlk

/-ahî/:berahî,timahî,

/-inde/:firinde,balinde,

/-ok/:zarok, serok,çîrok,

/-î/:kesnedîtî,parî,dergevanî,xwazgînî,serhatî,pêşwazî,

mîr**za**, heft**e**, kar**wan**, der**geh**, nîv**ek**, ron**dik**,ber**dan**, ga**van**, civ**at**,dez**geh**,rêv**îng**, bazir**gan**,guh**dar** ,

## 3.2.Peyvên Hevdudanî

## Nav/hevalnav+lêkera alîkar:

**Nav/hevalnav+kirin**:

Gez kirin,sulhe kirin,aşkera kirin,ava kirin,bar kirin,asê kirin, hazirî kirin, wer bûn/kirin,,xilas kirin,kerem kirin,xwuya kirin,pak û paqij kirin,pêşwazî kirin,bilind kirin,betal kirin,bawer kirin, gazî kirin,tembî kirin,rêkirin,hezkirin,ava kirin,rû kirin,

**Nav/hevalnav+bûn**:

Tengav bûn,xwar bûn,bêhêvî bûn,siwar bûn, kom bûn,berçav bûn,xerîb bûn, hişyar bûn,

**Nav/hevalnav+dan**:

Rayê dan,av dan,, nîşan dan, guh dayîn,paldan,

**Nav/hevalnav+ketin**:

Dûr ketin

## Nav/cînav+lêker:

Dawet û şahî gerandin,birsî hêlandin,dest hilanîn,xwe gihandin,xwe qeldayîn,bêhin vedan,xatir xwestin,tol hilanîn,xwe vegirtin,rûpêç,

## Lêkerên biwêjî:

hay pê heyîn/bûn,lê siwar bûn, ji yekê/î xerîb bûn,

ji hev safî kirin,xwe sist kirin, ser jê kirin, lê kirin,sêhr lê kirin,

Jêk dilmayîn,

lê xurîn,

bi ser yekê/î ve hatin,

bi rê ketin,

xwe enirandin,

xwe li piyan girtin,

hal û wextê hev pirsîn,

xwe bi destî ve berdan,

jêk dirandin,

bi rê ketin,

pê hesîn,

## Nav+nav:

navroj, navber, sernişîv, xweşîcan,

**Nav+rengdêr:**stûxwar,

**Rengdêr+nav:**nîvro,sîmirx,yekcar,tengav,

**Hejmar+hejmar**:çardeh,panzdeh,

**Nav/rengdêr+ e/bi/û /o +nav:**kevnemij, pîrejin, serober, çavbirê, pîremêr, şûneba, babelîsk,

**Nav+lêker+qertaf:,**dûmahîk,dûmahî,

## Çavkanî

1-Bedirxan Celadet;Bingehên Gramera Kurdmancî,Weşanên Nûdem,1994

2-Ciwan,Murad;Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi,Weşanên Jiyana Nû,1992

3-Tan,Sami;Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî,Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê,2005

4-Rizgar,Baran;Dersên Kurdî(Uygulamalı Kürtçe Dersleri)Weşanên Doz,…..

5-Muhammed,Husein;Kurtenerînek li hin beşênrêzimana kurdî,Weşanên Taybet ên Kovara Mehname:j. 13, *2002*

*6*-Karabax ,Abdullah;Rêzimana Kurdî ya Kurmancî- bi hîndarî -,2012

7-Sağnıc, F. Huseyn ;Hemanên Rezimanê Kurdi,Weşanên Melsa, İstanbul, 1991

8-Tan, Sami ;Rezimane Kurmanci, capa berfirehkiri, Enstutuya Kurdi ya Stenbole, 2011

9-Farqini,Zana; Turkce-Kurtce Sozluk, capa yekemin, Zana Farqini, Kurt Enstitusu-İstanbul, 2000

10- Farqini,Zana; Ferhenga Kurdi-Tirki, capa seyemin, Enstituya Kurdi ya Stenbole, 2004

11- Baran Bahoz- Bilbil Mikaîl ;Rêzimana Kurmancî Enstituya Kurdi ya Amedê